

**Ji bo dêûbavên, zarokên wan  
diçin hêlînên Berlinê**

06.05.2021

**Agahiyên temamker ên li ser Pereyê Zarokan ê Nexweşiyê, ku hatiye berfirehkirin**

Dêûbavên hêja,  
Stî û mîrzayên hêja,

bi riya berfirehkirina Qanûna Parastina Enfeksiyonê ya, ku di 23yê Nîsanê de kete meriyetê, mafê li ser Pereyê Zarokan ê Nexweşiyê ji bo 2021an careke din bêhtir hat dorfirehkirin. Mafê li ser Pereyê Zarokan ê Nexweşiyê zêdetir dibe, ku berê ji bo yek ji dê û bavî heqê 20 rojan bû, niha ji bo yek ji dê û bavî dibe heqê 30 rojan û bi vê yekê re ji bo dêûbavan dibe heqê 60 rojan. Her wisa ji bo dê yan jî bavê tenê jî ev heqê ji bo zarokê/ê dibe du qat, ku ji heqê 30 rojan dibe heqê 60 rojan. Gava gelek zarokên wan hebin mafê herî zêde yê yek ji dê û bavî dibe heqê 65 rojan, ji bo dê yan jî bavê tenê jî herî zêde heqê 130 rojan.

Mafê li ser Pereyê Zarokan ê Nexweşiyê, ku ji ber pandemiye dorfirehtir bûye, ne tenê gava ku zarok nexweş bikevin hingê heye, lê belê her wisa gava lînêrîna zarokan li malê pêwîst be, hingê jî heye, ku hêlîna zarokan ji ber pandemiye girtî be yan jî hin komên hêlîna zarokan di karantînayê de bin. Li gorî vê yekê bi gelemperî her wisa mafê wan kesan jî li ser Pereyê Zarokan ê Nexweşiyê heye, ku mafê wan ê lînêrîna acîl a zarokan heye û ew ji ber pêşniyara me li malê li zarokên xwe dinêrin. Wekî hete niha heqê Pereyê Zarokan ê Nexweşiyê bi qasî ji sedî 90ê meaşê net ê xebatê ye.

Ji kereme xwe re hûn serlêdana ji bo Pereyê Zarokan ên Nexweşiyê li sîgortaya xwe ya tenduristiyê bikin. Li wê derê hûn ê formên ji bo vê serlêdanê bigirin. Li gorî rewşê sîgortaya tenduristiyê ji bo vê yekê dixwaze, ku mirov belgeya piştrastkirinê ya hêlîna xwe pêşkêş bike. Mîna keke ji bo vê belgeyê jî li gel vê nivîsê amade ye. Me ji hêlînên zarokan rica kir, ku gava pêwîst be, ew vê belgeyê ji bo we amade bikin.

Agahiyên berfirehtir ên li ser Pereyê Zarokan ê Nexweşiyê hûn dikarin li ser vê bibînin:

<https://www.bmfsfj.de/bmfsfj/fragen-und-antworten-zu-kinderkrankentagen-und-zum-kinderkrankengeld-164976>

Gava mafê we li ser vê yekê tune be (mînak wekî Sîgortadariya Taybet) hûn dikarin wekî alternatîv li gorî rewşê daxwaza mafê tezmînatê ya li gorî § 56 bend 1a ya Qanûna Parastina ji Enfeksiyonê (IfSG) bikin.

Agahiyên berfirehtir ên li ser vê hûn dikarin li ser vê bibînin:

<https://www.berlin.de/sen/finanzen/service/entschaedigung/schulschliessung/artikel.935438.php>

**Ji bo pirsên we, xeta telefona acîl a dêûbavan a Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan hêj jî bi berdewamî di xizmeta we de ye. Hûn dikarin bi vê hejmarê 030 - 90227 6600 di tevahiya rojên xebatê de ji saet 9an hete 13an xwe bigihîninê.**

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk